

Pirsiyar û Bersiv

Kengê û li kû derê bestenî (ayis kirîm) derketine?



Berî pêncî salan, xelkî bi tenê li havînan bestenî dixwarin, lê niha li hemû rojên salê. Bo yekem car bestenî li Çînê derketine. Berî 700 salan Marco Polo hunerê çêkirîna wê ji Çînê bire Ìtallya û ji Ìtallya çô Firensa û paşî li hemû dînyayê belav bû.

Lê yekemîn kargeha bestenîyan li Amerîka li sala 1851î hatîye danan. Li sala 1900ê pişî sarıncok selace hatîye dahênan çêkirîna bestenîyan gelek pêşkefî. Bestenî ji nîvşik, şîrî, şekirê, bêhn, çej û rengên xweş û ciwan dihêne çê kirin.



Sê egerên serekî zêr giranbiha kirine:
Yek ciwaniya wî, du mifayê wî û sê jî ji ber ku di sîrûşî de gelekê kêm e. Heger asin jî wekî zêrî yê kêm ba renge asin jî wek wî yê giranbiha ba.

Zêr mêtalekê zer, nerm û bi sanahî ye ji bo formklärinê.

Her wesa rengê xwe bernade û rengê wê ji ber vê çendê jî bûye ku xelkî her ji kevin de pare jê çêkirîne û ji bo xemillandinê bi kar ïnane.

Zêr li gelek welatan heye lê Başûrê Efrîka dewlemdîrin welate bi zêrî û nîva zêrê dînyayê li wê derê dihê derxistin.



Boçi zêr wesa yê giranbiha ye?





Bo či darikoke daran kun dike?

Darikokey nûkilekê rast û mukim û sertûj heye. Bi wî nûkil qelpê darê kun dike û paşî bi ezmanê xwe yê dirêj û zirav kirma ji wan kuna dîne der û dixwe. Gelek xelk wesa hîzir dikin ku darikoke ziyanê li darubarî dike lê ev hizire ne ya raste û darikoke bi vî karê xwe darê ji kurm û kêzên ziyander rizgar dike.

Bo či hindek bi şevê xirrxirrê dikin?

Hindek mirovan arêşeyên bêhnhelkêşanê hene ji ber ku borlyêwan yên bêhnhelkêşanê di dirust nînlin û gelek caran difnên wan girtîne ji ber hindê neçar dibin bêhna xwe di devê xwe re bihelkêşin û hîngê xirrxirr ji wan dihê. Ew mirovên di xew de xirrxirrê dikin ji bifî ku tenahîya dewr û berên xwe têk didin, ew bi xwe jî baş nanlivin ji ber hindê bi rojê hest bi wesiliyanê dikin û ya baştir ew e çareseriya xwe bîkin.

